توزع مجـــــاناً

WELAT DERBASÎ

SALA XWE YA "6"MÎN DIBE

welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat
ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة
العدد (٤٩) ٢٠١٨/٤/١ م

Welat
49
01/04/2018
Çandî - Giştî - Serbixwe

OXIR BE

DILJAR

Welat

PEYVA WELAT

Oxir be Diljar

Aras Yûsiv

Kovara **WELAT**
Çandî- Gişţî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desţeya rêvebir:
Mihemed Zekî Mihemed

Dizayner:
Hesen Berzencî

Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Gelek hevpeyvîn û axaftin berî her hejmarekê ji kovara welat bi sernivîserê kovarê yê berê Diljar Seyda re dihatin kirin, aniha zehmet e ez bawer bikim ku ev yek nema vedigere, êdî nema kar, guftûgoyê an axaftineke ku gelek caran dengê ken û kêfê di ber re dihat bihîstin bi Diljar re bikim. vî tiştî hişt ku koça Diljar bêtir li ser milê min giran be.

Ev axaftin dema bijartina doseya hejmarê bûn, mijarên ku em ê destê xwe deynin ser wan, helbet gelek hûrgiliyên din hebûn nemaze bi kesekî wek Diljar re ku herdem hewil dida çi karê ku bike bi rêk û pêk be.

Li ser dirêjahiya wan hejmarên ku nêzî 30 î bûn, têde Diljar sernivîserê kovara me bû, gelek mijar, dose, gotar, rapor, hevdîtin, helbest, çîrok …hatin weşandin.Helbet kedeke mezin di vê derbarê de dihat kirin nemaze di rewşeke wek ya rojavayê kurdistanê de ku rûdaw û guhertin têde pir in. Ji bilî mijarên girêdayî peydabûna elektrîk û internetê. Van astengiyan herdem hêz didan Diljar ku hejmara nû ji ya berê xurtir be, têde nivîskar , mijar, û raporên nûtir hebin.

Piştî xatirê bê dawî yê ku Diljar ji me xwest, ev yekemîn hejmar e tê weşandin. Şopa Diljar dê di jiyana malbat, heval û dostên wî, herwiha di vê kovarê de jî herdem hebe, ji ber ew bibû qonaxeke dewlemend û hêja di jiyana kovara welat de.

Di her serkeftinekê de em ê te bibîr bînin Diljar weku tu di nav me de ye, weku hîn ev xatir nehatibe xwestin, weku xwendevanên vê kovarê her hejmar li benda tiştekî ji te bin ji bo bixwînin.

Oxir be Diljar, em ê te ji bîr nekin, em ê herdem te bibîr bînin, bila serê malbata te sax be û sebir ji malbat, dost, û hevalên te re be. ■

تَبنَّى ثورة
adopt a revolution

BÎRANÎNIN BIRÎNDAR

Imran Yûsiv

Li qorziya odeyeke biçûk xwe li hev pêçabû, nalîna wê mîna mûzîkeke keserkêş li tarîtiya odeyê belav dibû, laşê wê tevde dilerizî, agirê mûmeke sêwî ronahiyek sivik tavêt ser wêneyê ku bi dîwar ve daleqandî bû, wêneyê bûkaniya wê bîranaînên wê tevradikir.

Mirov çiye ji bilî komek bîranîn ..!!?

Bi çavên tijî hêsir hundir dişopand, her deverek , her kelûpelek, jiyanekê di hinava xwe de hildigre, dîroka demên derbasbûyî belge dike, cih û tenê cih, demê di giyanê tiştan de hiltîne, mirov eksîra jiyana xwe ji wan bîranînên ku di giyana tiştan de veşartî ne digire.

Mirov bê bîranîn ne tiştek e.

jiyan û mirin ne tenê tiştin fîzîkî ne, bi lêdana dilekî dest bi jiyanekê dibe, lê belê bi rawistîna dilekî jiyanek bi dawî nabe .

Pêjna levekê di zikê xwe de kir, pêre qolincin dijwar xwe êrîşî nava wê kirin.

Pişta xwe spart dîwar, hewlda ku pêlên metirsiyê ji mejiyê xwe ve dûr bixîne.

li derve, bajar di bin top û guleyan de dinaliya, libên axê vedireşiyan , kolanan gazî û hawar dikirin, bêhina mirinê ji her deverê dihat, destin biyan cilên bajêr diçirandin , bi hemû hêz û hovîtiya xwe destdirêjî li bîranên wî dikirin, alên reş li ser xaniyan hildidan , cilên reş ku ji rengê rihên wan yên dirêj bûn, li bajarê rojê dikirin.

Bi bilindbûna dengê teqînan re, şer gurtir dibû ,meydan û qadên bajêr di bin çavan re li çeteyên biyan dinerîn , û ji hev re digotin:

welatê rojê nabe hêlîna barçemokan.

Cilên reş bi te nakevin welato ,welatê rengan ,welatê keskesor û perperîkan,tenê ronahî bi bejna te dikeve.

Pêlên qulincan dijwartir dibin ,li wêneyê daleqandî dinere ,destê xwe datîne ser zikê xwe ,hemû hêza xwe dicivîne û tiştê di zikê xwe de didehfîne.

-Bila navê wê Jiyan be ….eger ez venegeriyam hezdikim navê wê Jiyan be.

tifinga xwe da milê xwe, hinarka riwê wê ramîsand û derket.

bêhina dengê wî, ji wêne , dîwar ,ji pencere , ji her aliyekî û hustekê ji xanî dihat .

Pêjna gavên mirinê dikir , bi hemû hêza xwe didehfand ,ew û mirin rû bi rû li hember hev rawestiyan ,li çavê mirinê nerî û got :

ji te natirsim ….lê kêlîkekê bihêle dilê min lêbide ….tenê kêlîkeke kurt…..

Sawekê dilê mirinê girt ,li wêneyê daleqandî nerî, gavek bi paş de avêt, berê xwe da qorziya dûr û di cihê xwe de kêlîkek kurt rûniştî ma .

li qorziya xanî û di nav golek xwîn de keçek biçûk liviya , dengê giriyê wê li seranserî bajêr belav dibû.

deriyê xanî vebû , mêrek birîndar derbas bû , çeka wî di dest de bû ,berê xwe da qorziya xanî ,dema ku keça biçûk çav lê ket girnijî , bêhina gul û binefşan ji hundir dihat.

şervan çeka xwe da milê xwe, rahişt keça biçûk , ew himbêzkir ,kêlîkekê li ber wêneyê daleqandî rawestiya , ew û keça xwe bi tîrêjên rojê ve hilperikîn, jinek di wêneyê de girnijî….. ■



قلت للنهر

محمد رفي

أنا الماء
حين تلمع صورتك
في الزلال
ويخرج هذا السواد بلطف
وأنا اصطاد خوفك مني
كي أحوله إلى فرح
في شارع عرفته مرارا
يمضي في أوجه شذوذ الكلام
كأنه هجرانك
من لمسة
تعرفها حدود يدي
مخافة منك
أتودد إلى هذا العالم
كما أراه بعينيك الجميليتين
لا سوادا
كما تهمس حين تشغف أذني
حسرة الموسيقى
وتطلين على شارع أحبه
وأنا جديد عليه
أقطف لك مفردة
تتسع لجمالك
ما عساه الورد أن ينحني
في هذه الآفة !
لوتعلمين
كم قطعت هذا الشارع
وكنت بأمس الحاجة
أن أرى بصيصا منك
كانت جملي تغار
أضيعها وهي تغادر لساني
لي شكوة واحدة
أن أفيق من نوم
وتبقى كما أشاهدك كل يوم
لايبعدني أي حياء منك
بما تعذب القلب من خاطر
سبيلا إلى مودة
نعم أنا أرى
نعم كما أريد
روحي كما تبغي !.

Laleş Ebdulrehman

TAMA PIRTEQALAN

Belê...
tenêtî dosta xeman e
dayika diltenik ya ramanên mezin e
Himbêza wê germ e
Dema dil şkestî û can tarî be
bihnteng û jiyan dijwarî be
gula baweriyê bêbêhin û çilmisî be
Wê guliyên xwe bide te
daku tu hêviyên xwe pê bihûnî
Wê bihêle
tu şeva porê wê
bi destê xwe cot bikî...
Nigê hespê bêrîkirinê
bi bijankê heyvê girêdide
Tenêtî jinek çeleng e
Stêrkan parve dike
Bihina baranê û tama pirteqalan
jê difûre...

GELO NAVEKÎ TE YÊ DIN HEYE?

Hekîm Ehmed

Bêguman di salên bûrî de, bi bûyerên kirîz û cenga li Sûriyê re, gelek guhertin di civaka vî welatî de bi giştî derketin û wan guhertinan bandor li civakê û têkiliyên civakî jî kir, ragihandin û toreyên têkiliyên civakî û medyaya civakî, diyardeyeke balkêş di civaka me de bû.
Belê, niha derfet bêhtir heye ku mirov xwe bide nasîn û aliyên kesayetiya xwe, nerînên xwe, hestên xwe û heya bi afirandina xwe jî bide nasîn û belav bike, lê çima hin kes hene ku navekî ji bilî navê xwe yê ku pê tê naskirin bikar tînin? Sedem çi ne? Çi aliyên wê yên erênî yan neyînî hene?
Navê nivîskar û hunermendan:
Helbet bikaranîna navekî din, ne girêdayî civaka Kurdan bi tenê ye, lê weke diyarde di dîroka civaka me ya nêzîk de, ev li ba nivîskar û hunermendan hebû, yek ji sedemên vê ku wî kesî dixwest xwe ji ber çavên desthilatdarên dektator veşêre, heya asta ku hin berhem di kovarên Kurdî de hatine weşandin û xwediyê wan yên rasteqîn bi zelalî nayên naskirin, herwiha peydakirina navekî Kurdî yan navekî hunerî carina bi rola xurtkirina nasnameyê radibû û ne ku veşartina kesayetiya rasteqîn bû, lê belê zelalkirin û çespandina bîr û baweriyan bû, weke navên seydayê Cegerxwîn û Tîrêj û Bêbuhar û helbestevanên din ku dixwestin kesayetiya xwe ya netewî û afrênerî bêhtir berçav bikin.
Ji aliyekî din ve, carina di kovarên Kurdî de bêhtirî navekî ji heman nivîskarî re hebû, mînaka herî balkêş mîr Celdet Bedirxan e ku bi gelek navan dinivîsî û vê yekê derfet dida ku di heman hejmara kovara xwe de, bêhtir ji gotarekê biweşîne, herwiha hin nivîskar û sernivîserên kovarên piştî wî jî ev awa bikar anîn, carina ji ber kêmbûna nivîskaran.
Navê malê û navê nifûsê:
Ji salên 1950î û vir de, hêdî hêdî Kurdên Rojavayê Kurdistanê navên Kurdî û yên sivik li zarokên xwe dikirin, ev yek alîkar bû bi derketina nifşekî ku ti pêdiviya wî bi guhertina nav tine bû bi mebesta zelalkirina nasnameya xwe ya netewî, ji ber navên piraniya wan Kurdî bûn, herwiha ji bo navekî wêjeyî yan hunerî jî, gelek caran navê rasteqîn bi kêrî wê armancê dihat, lê dîse jî, carina ew navên ku dê û bavên zarokan ji wan re dibijartin li dezgehên dewletê û qeydên nifûsê dihatin qedexekirin û vê yekê hişt ku gelek kes bi du navan bin, navê malê û navê di nifûsê de.
Navê din û toreyên têkiliyên civakî:
Bi belavbûna toreyên civakî di nav xelkê de, gelek kesan navine din li xwe dikirin, lê ew ne bi yek mebestê û yek rengî bûn, hin kes bi wê armanca kevin xwestin ku nasnameya xwe bi navekî Kurdî bidin pêş, lê van kesan rastiya kesayetiya xwe venedişartin, hin jin û keçan jî navê zarokên xwe bikar tanîn ji ber fedîbûnê yan jî tirs li ba wan hebû ku di meydana nû ya enternetê de hin alozî û acizkirin ji wan re derkevin û van jinan wêneyê xwe û eşkerekirina kesayetiya xwe, tenê di çarçeweyeke teng a malbat û hevalan eşkere dikir. Sedema din ku hin kesan navine din bikar tanîn ew bû ku wan dixwest nerînên xwe bi azadî derbibirin bê ku pirsgirêk di jiyana wan a rasteqîn derkaevin, wilo ew dikarîbûn xêzên sor yên siyasî û civakî derbas bikin û derbarê her mijarekê nerîna xwe bê tirs bibêjin, lê mixabin hin kes hebûn ku ne tenê azadiya xwe bi kar tanîn, lê belê fitne dikirin, nakokî gur dikirin û bê hesab êrîşî kes û aliyan dikir.
Dibe ku her kesek ji van rewşek taybet be, lê bi nerîna min eger mirov nexwaze kesekî bixapîne û bi dilpakî destê xwe bo hevnasîn û têkiliyên avakî dirêj bike, herwiha hest û ramanên xwe jî belav bike, gerek e ew karekî eşkere û bi zelalî be, eger carina girêdan û sînor hebin jî, mirov dikare bi bîreweriyê wan sînordar bike.

WEŞANGERIYA KURDÎ, DI HEYAMA DÎROKÊ DE

Izedîn Salih

Hozanyarê Îngilîz "Francis Bacon" dahênana çapxaneya nûjen ji aliyê dahênerê eleman "Johannes Gutenberg" ve di sala 1447an de, weke yek ji girîngtirîn geşepêdanên destpêka serdema nûjen binav dike, em jî dikarin bibêjin ku Kurdan di sedsala 19an de dikarîbûn xwe bigihînin serdema nûjen, çiku wekî tevahiya deverên rojhilata navîn, li Kurdistanê jî çapxane gelekî dereng ji aliyê Kurdan ve hatiye bikaranîn.

Belê, çapxaneyên li Kurdistanê ji aliyê komên olî ve, û bêhtir bi destê Xiristiyanan hatine avakirin, zêdebarî ku avabûna wan jî di sedsala 19an de hatiye encamdan. Nivîskar, lêkolîner û akadîmisyen Ibrahîm Malmîsanij di vî barî de dibêje, ku heya dema şerê cîhanê yê yekem jî, hîn Kurd ne xwedî çapxane bûn, herwiha çapxaneyên ku hebûn an ên destbilatê, an jî ên mîsyonerên rojavayî bûn, ji lewre, pirtûkên pêşîn ên bi Kurdî li derveyê Kurdistanê, li cihên wek Qahîre û Stembolê hatine çapkirin.

PIRTÛKÊN KURDÎ:

Li gorî lêkolînan eşkere dibe ku yekemîn pirtûka Kurdî di sedsala 18an de li Stembolê hatiye çapkirin, û di navbera mêjûya çapbûna wê û mêjûya dahênandina çapxaneya nûjen de zêdetir ji 400 salî hene, ku di heyama wan 400 salî de, bi zimanên din li cîhanê bi hezaran pirtûk, kovar, rojname û berhemên nivîskî hatine çapkirin.

Di sala 1856an de, û dîsa li Stembolê, pirtûka Incîlê ya pîroz ji hêla Civaka Incîlê ya Emerîkî (American Bible Society) ve bi Kurdiya Kurmancî û tîpên Ermenî hate çapkirin. Ji sala 1844an ta bi sala 1923an bi tîpên erebî 20 pirtûkên bi Kurdî derçûne, pirtûka herî berz ji nav wan (Mem û Zîn) a Ehmedê Xanî ye, ya ku di sala 1919an de hatiye çapkirin, û ji hêla rayedarên Osmanî ve hatiye qedexekirin.

Bi damezirana KomaraTirkiyê re, rewşa weşangeriya Kurdî xerab bû, komara ku hate damezirandin zimanê Kurdî qedexe kir, ji lewre di salên navbera 1923 û 1965an de bi tenê 2 pirtûkên bi Kurdî hatine çapkirin. Piştî sala 1965an, an ku piştî 40 salî ji bêdengîyê, cara pêşîn pirtûkeke şanoyê û yeke rêziman bi Kurdî hatin çapkirin, pirtûka şanoyê ya bi navê Birîna Reş a nivîskarê Kurd Mûsa Anter e.

Di sala 1999an de, hejmara pirtûkên Kurdî yên ku di heyama sedsalekê de hatine weşandin gihîşte 212 pirtûkan, nivîskarê lêkolîner Ibrahîm Malmîsanj di pirtûka xwe ya bi sernavê (Duh û îroya weşangeriya pirtûkên bi Kurdî Li Tirkî û Sûrîyê) de dide zanîn ku li Tirkiyê, ta bi sala 2006an, 654 pirtûkên bi Kurdî hatine çapkirin, ku 580 pirtûk ji wan bi zaraveya Kurmancî ne, herwiha du weşanxane hene ku bi tevahî pirtûkên bi zaravaya Kurmancî çap dikin, yek ji wan Vate ye, ya din jî Roşna ye, di salên dawî de weşanxaneya Aryayê jî pirtûkinin bi Kurmancî weşandine.

Di gel zanyaran, di heyama 15salên dawîn de, rewşa weşangeriya Kurdî ji berê baştirdibe, û hejmara pirtûkên bi zimanê Kurdî bi awayekî salane zêde dibe. Sala 2005an herî kêm 54 pirtûkên bi Kurdî gihiştine ber destên xwêneran, û sala 2006an 84 pirtûk, û sala 2007an hejmara wan gihişte 109 pirtûkan, herwiha Ji sala 2007an û vir de hejmarqet kêmî 100î nebûye. Herî dawî, di sala 2015an de ev hejmar gihişte 250 pirtûkên bi zimanê Kurdî, vêca dema ku em hejmara van pirtûkan didine ser hev, em dibînin ku di nava deh salên dawî de zêdetirî 1000 pirtûkên bi Kurdî hatine çapkirin, li gorî vê encamê , di nava dehsalên dawîn de hejmara pirtûkên bi Kurdî yên ku hatine çapkirin ji yên ku di nava sed salên dawîn de hatine çapkirin pirtir e.

WEŞANXANEYÊN KU PIRTÛKÊN BI ZIMANÊ KURDÎ ÇAP DIKIN:

Zêdebûna hejmara pirtûkan bêhtir bi zêdebûna hejmara weşanxaneyan ve girêdayî ye, bêhtirî 40 weşanxaneyên Kurdan piştî sala 2000an hatine damezirandin, berî sala 2000an jî weşanxaneyên Komal (1974), Deng (1989), Doz (1990), Weşanên peymangeha Kurdî (1992), Nûbihar (1992), Avesta (1995), Pêrî (1997) û Aram (1997) hatibûn damezirandin.

"رزو أوسي...الرقيق كجناح فراشة"

محمد عبدو النجاري

... وصديقي الرقيق كجناح الفراشة، رَزو»!

بهذه الكلمات وصف شاعر كردي، الأديب عبد الرزاق أوسي(رَزو)!

سيبدو ما سأكتبه عن رزو عاجزاً عن وصفه، شاعراً مرهفاً ووطنياً حتى النخاع !

كرّس رَزو حياته في خدمة الثقافة الكردية. كان، بعد تخرجه من المعهد العالي للنفط في موسكو، وعودته إلى البلد في سنة ١٩٨٠، يصدر بمفرده مجلة»ستير» باللغة الكردية. يكتب معظم موادها ويحرّرها ويطبعها على آلته الكاتبة ويوزّعها في ظروف أمنية صعبة. يساعده في ذلك الأديب المهندس زَغروس حاجو.

كان واحداً من أربعة أصدقاء أسّسوا في موسكو»رابطة كاوا للثقافة الكردية». ودفع من كيسه نفقات ترجمة الكتاب الأول في سلسلة الرابطة المذكورة.

كان مستعداً من أجل نشر اللغة الكردية وآدابها، أن «يضع رأسه تحت حدّ الفأس» !

كان أستاذي في اللغة الكردية، وناقداً صارماً لما أكتبه. غادرنا قبل أن أنهي تعليمي على يده.

قرأتُ عليه وعلى عدّة أصدقاء آخرين ذات يوم، أولى محاولاتي في كتابة القصة القصيرة. صمت قليلاً بعد أن فرغتُ من قراءتها، ثم قال:لم أقرأ في حياتي قصصاً واقعية جداً مثل قصصك. كأنك حملت كاميرا وصوّرت أحداثها وشخصياتها، أين الفنّية في هذا كله ؟

فصرتُ، كلما شرعت بعدئذ في الكتابة، أتذكر ما قاله لي يومئذ .

لم يكن يعرف المجاملة الفارغة. كان حازماً في أحكامه الأدبية والسياسية، وبالغ الرّقة في علاقاته الإجتماعية!

هجر السياسة، ولكنه كان يبذل قصارى جهده لتوحيد صفّ الحركة الكردية. يقدّم النصيحة للشباب الأدباء الذين بدأوا كتابة أعمالهم باللغة الكردية، ويراجع أعمالهم ويصحّح أخطاءهم. يبتهج لكل نتاج أدبي قيّم،

و يتميّز غيظاً عندما يقرأ عملاً فنياً مبتذلاً مكتوباً بلغة كردية مليئة بالأخطاء.

كتب مقالات نقدية قيّمة عن روائيين كرد ألفوا أعمالاً روّج لها النقد على الرغم من ركاكتها لغةً واسلوباً، وتفاهتها شكلاً ومضموناً !

كان يمقت الإبتذال في الأدب، والإنتهازية في السياسة .

أمّا لغته الكردية فكانت نقية وشعرية ومخملية !

كان يهزأ من الكرد السوريين والعراقيين المقيمين في الخارج، الذين إذْ يتجنبون إستخدام المفردات العربية في حديثهم، يستبدلونها بكلمات لاتينة، فيخرج كلامهم مثيراً للسخرية !

بعد الإنتهاء من تناول الفطور في بيته ذات يوم، فاجأني بعد لحظات :

- جميل ما قلته، قبل قليل.

- ماذا تقصد؟

- دَنْديك بَنير(قطعة جبنة) فلم أسمع كلمة دَنْديك من زمان!

لم يكن يعرف المساومة على سوية النصوص الأدبية. أرجأ،مثلاً، نشر حكايات الأطفال التي أصدرناها معاً، سنوات كثيرة. مؤكداً أنها لا ترقى إلى مستوى الحكايات التي كتبها للأطفال ليف تولستوي.

أمضينا معاً ساعات طويلة، في دارهم بقرية»دَكشوري»، وفي منزله أولاً في رميلان ثم في القامشلي، نختار من بين عدد كبير جداً من الحكايات الشعبية الكردية للأطفال، التي كان جمعها في عشرات

الأشـرطة ومئـات الصفحـات. توصلنـا أخيـراً إلـى إختيـار خمـس وعشـرين حكايـة منهـا، طبعناهـا علـى حسـابنا الشـخصي فـي دمشـق،بعد موافقـة وزارة الإعـلام السـورية، باللغتيـن الكرديـة والعربيـة، ونشـرناها فـي خمـس مجموعـات مصـوّرة، معتقديـن أن الكـرد سيتهافتون علـى شرائها، وسـنطبعها طبعـة ثانيـة وربمـا عاشـرة. ولكـن النتيجـة كانـت مخيّبـة.

وزعناهـا علـى مخـازن الكتـب مـن ديريـك إلـى الشـام. وكان الإقبـال عليهـا ضعيفـاً. قـال لـي فـي أثنـاء إحـدى الزيـارات إنه استعاد النسـخ مـن مكتبـة رميـلان وسيسـتعيدها مـن المكتبـات الأخـرى أيضـاً. الأمـر الـذي قـام بـه فعـلاً، فجمـع حصّتـه مـن الكتـب فـي صناديـق كبيـرة ووضعهـا فـي سـقيفة منزلـه فـي القامشـلي، قائـلاً:»لا أسـتطيع رؤيـة الغبـار يتراكـم عليهـا فـي واجهـات المكتبـات الكرديـة. فلترقـد فـي سـقيفتنا بأمـان ونظافـة علـى الأقـل ! «

كنّـا وضعنـا معـاً خطـة عمـل طويلـة تشـمل نشـاطات كثيـرة:

- الإستمرار في جمع وتدوين أكبر قدر ممكن من التراث الشعبي الشفوي الكردي .

- تصويـر أفـلام وثائقيـة بكاميـرات فيديـو عاديـة، نسـجّل فيهـا حيـاة المجتمـع الكـردي: العـادات والتقاليد. الـزواج، تعـدّد الـزواج، الطـلاق. البديلـة، الحيـار، الخطيفـة، الحـب ، الخيانـة الزوجيـة. ألعـاب النسـاء والرجـال والأطفـال وأغانيهـم فـي أثنـاء مختلـف المناسـبات: الحصـاد، الأعراس،إعـداد المؤنـة، وحفـلات الحنـاء عشـية العـرس، والصباحيـة غداتـه، وغيرهـا.

- تسـجيل حيـاة المجانيـن الكـرد وحكمائهـم، وسـيرة الفنانيـن والسـاخرين.

- التعريـف بالشـخصية الكرديـة:الكريـم الـذي يقـدّم لضيفـه علـى الغـداء كبشـاً، وعلـى العشـاء ثوراً،كمـا يُقـال، والبخيـل الـذي يحسـب علـى ضيفـه حتـى الهواء الـذي يتنفسـه فـي بيتـه! المتعجـرف مثل»فرعـون» والبسـيط مثل»مرحبـا»! الـذي يكـذب كمـا يتنفـس، والصـادق كالأنبيـاء. العزيـز النفـس، والخسّـيس الوضيـع !

- طباعـة أعمـال الأدبـاء مـن ذوي اللادخـل أو الدخـل المحـدود علـى حسـابنا الخـاص وتوزيعهـا لمصلحتهم.

كانـت مشـاريعنا كثيـرة، وآمالنـا كبيـرة. ولكننـا لـم نسـتطع تحقيقهـا كلهـا، بسـبب ضيـق ذات اليـد، والأجهـزة القمعيـة، التـي كانـت تقف بالمرصـاد لـكل نشـاط، لا سـيما إذا كان ثقافيـاً مسـتقلاً، خـارج عـن إطـار العامليـن فـي فلكهـا.

غيـر أننـا لـم نتوقّـف عـن إنجـاز مـا يمكـن إنجـازه.

كتـب رزو قصائـد كثيـرة، وجمـع المئـات مـن الحكايـات والملاحـم الغنائيـة والتاريخيـة الكرديـة وكتـب الروايـة والقصـة القصيـرة، والأبحـاث النقديـة.

مريضـاً، قـال ذات لحظـة سـكنت فيهـا آلامـه :

- بكـرا بـس أطيـب، راح أعمـل نيغـار أميـرة !

فقلتُ له:

- لقـد جعلتهـا أميـرة منـذ أن اقترنـت بهـا.

- سأجعلها أميرة إذاً، مرتين !

لقد لعبت زوجتـه- نيغـار سـامي أحمـد نامـي- دوراً كبيـراً فـي حياتـه الإبداعيـة والإجتماعيـة. كانـت خيرمعيـن روحـي ومعنـوي لـه. لا ينشـر نصـاً إلا بعد أن يقرأه لها، مؤكداً إن رأيها هو الأهم عنده.

صـدر لـه مجلّـد بالكرديـة فـي اسـتنبول ٢٠١٤ بعنـوان: أبحـاث رزو اوسـي، يحـوي بعضـاً مـن أعمالـه:

- إجتماع الأحذية- رواية.
- قصائد مختارة.
- مرغانة- قصة شعرية طويلة للأطفال.
- غفوة- قصص شعرية(مذكرات بلا حدود).
- دراسات نقدية.
- دبابيس. مقالات ساخرة.

- تربيـة الأطفـال والإعتنـاء بهـم فـي المجتمـع الكـردي القديم.

يتـمّ العمـل حاليـاً علـى إصـدار مجلّـد آخـر، يضـم بقيـة أعمالـه الشـعرية والنقديـة والتراثيـة.

Weşanxaneyên Kurdan di ber pirtûkên bi Kurdî re pirtûkên bi erebî an tirkî jî çap dikin, anku bêhtirî wan du zimanî ne, lê di salên dawîn de hin weşanxane giraniyê didine ser pirtûkên bi Kurdî, weşanxaneya Komalê ta îro bi dehan pirtûk çap kirine, li gorî jêderan ku ta bi sala 2010an ev weşanxane çalak bû, lê ji piştî wê sale nayê zanîn bê ka wê pirtûk çapkirine yan na, herwiha weşanxaneya Deng jî di heman rewşê de ye, ku van herdû weşanxaneyan di warê dîrok û wêjeya Kurdan de bi dehan pirtûk çapkirine. Yek ji weşanxaneyên Kevin weşanxaneya Doz e, ji sala 1990î û vir de bi dehan pirtûkên bi Kurdî çap kirine, li gorî zanyariyan, vê weşanxaneyê herî dawî di sala 2013an de pirtûk weşandiye, li aliyekî din ve jî weşanxaneyên peymangeha Kurdî, Nûbihar, Avesta, Pêrî û Aram, ji berî bêhtir ji bîst salan ve, di warê weşangeriya bi Kurdî de çalak in, zêdebarî ku weşanxaneyên Alan, Apec, Amara, Ar, Arya, Ava, Azad, Bajar, Belkî, Berbang, Berçem, Berfîn, Beroj, Beybûn, Bîr, Çetin, Çira, Dilop,Dîlan, Dîwan, Do, Elma, Fam, Firat, Hêlîn, Hêvî, Hîva, Hîvda, Koral, Lorya, Melsa, Mem,Mîr, Nûdem, Nûjen, Pelêsor, Peywend, Şîmal, Ronahî, Roşna, Rûpel, Sî, Sîpan, Tevn, Veng, War, Welat, WeşanênDîsa, WeşanênEvrensel, Zehra, û herî dawî weşanxaneya Dar li Qamişlo jî pirtûkên bi zimanê Kurdî çap dikin.

NAVEROKA PIRTÛKÊN KURDÎ:

Di salên dawîn de weşanxaneyên Avesta, Aram, Lîs, Nûbihar û Vate di ware weşandina berhemên wêje, werger, û klasîkên Kurdî de çalak in, herwiha di nava pirtûkên Kurdî de, herî zêde berhemên wêjeyî, di nava wan de jî herî zêde pirtûkên helbestê hatine weşandin, di warê dîrokê, wergerê û hin warên din de, pirtûkên bi Kurdî kêm in, hêjayî gotinê ye ku berhemên wergerê, ji aliyê weşanxaneya Lîsê ve, di van salan de zêde dibin, û li gor serjimêriyên ku nivîskarê lêkolîner Malmîsanij berhev kirye, ji 654 pirtûkên çapkirî, 174 ên helbestê ne, 69 jê roman in, û 65 jê jî pirtûkên kurte çîrokan in, herwiha em dikarin bibêjin ku di nava sedsalekê de 200 pirtûkên romanê bi Kurdî hatine weşandin.

Wekî gotina dawîn, nivîseke wiha kurt vê babetê têr nake, û di warê dîrok û rewşa weşangeriya bi Kurdî de pêwîst e ku gelek lêkolînên bihûrgilî bêne kirin.

JÊDER:

Malmîsanij, pirtûka (Duh û îroya weşangeriya pirtûkên bi Kurdî li Tirkîye û Sûrîyê), Weşanxaneya Vate, Stembol, 2006.
Hasanpour, Amir, Netewperestî û ziman li Kurdistanê 1918-1985, Weşanxaneya Avesta, Stembol, 2005.
Kurte dîroka weşangeriya Kurdî, Kovar, Candname, 2017.
Zeriya Wikipedia ya eliktironîk.

والفاسدين، ومن يمتلكون القدرة على إلغاء الآخر، واجتثاثه، نتيجة عقدة نقص، أو بسبب وقوفه حجرة عثرة أمام طريق تحقيقه لنزواته العابرة.

أمام مشهد ممتلىء بالتناقضات، يمكنني استقراء وتقديم شخصية دلجار، وهو الشخص غير العادي الذي طالما آلمه أنه لم يتابع دراسته، وصار يعوض عن ذلك بعصاميته العالية ليكون من عداد المثقفين الذين يكتبون بلغة كردية تحقق سويتها العالية، وليكون معلماً لها ضمن دائرة مكانه، ومدوناً بها، وناشراً لها، محافظاً على معادلته الاجتماعية، في علاقته بالمحيط الذي راح يوسعه- لاسيما في الزمن الافتراضي- وليكون فوق كل هذا صاحب موقف، مستوعب لمن حوله في اختلاف رؤاه أو رؤاهم، في مواجهة كل السدود الموضوعة، والتي باتت تتفاقم، وفي هذا ما ينم عن مدى شساعة روحه المستوعبة للآخرين، بما يدعوني للجزم، بأنه لم يكن ليحقد حتى على عدوه، على النحو الثأري، المتفشي، وفي هذا أعلى مراتب الحلم، والحكمة، والحنو الذي استشففته في شخصيته، بالرغم من تواصلنا المتقطع- وهنا فإنني لألومني على هذا التقصير- فقد قال لي في إحدى رسائله الأخيرة إلي: أأنت زعلان مني عمو؟، وأرسل إلي قصيدة له مكتوبة باللغة العربية، مستدركاً: لقد كتبتها، مع أني لا أكتب إلا بالكردية، وأعترف أنني كنت مقصراً أمام فيض وداده ووده، نتيجة مشاغلي-وأية مشاغل؟- وواصل قائلاً، في هذه الرسالة الأخيرة: إني أقدر مشاغلك، وهوما أحزنني أكثر، لأنني لم أخصص له وقتاً أكثر، كما كنت أفعل من قبل؟!

فاجأني دلجار أكثر من مرة، بترجمة قصائد لي، ومن بينها قصيدة «شنكالنامة» ونشر بعض هذه الترجمات في موقع ولاتي مه، على ما أذكر، كما أنه اتفق مع الصديق صبحي دقوري على ترجمة كتابي السيروي»ممحاة المسافة»، إلا أن ذلك لم يستكمل-للأسف- لأسباب لا مجال لذكرها هنا، ولم يكن هو السبب في ذلك، كما تبين رسائلنا المتبادلة، إلا أن هذه الترجمة كانت أحد مشاريعه المستقبلية.

ثمة جوانب كثيرة في حياة دلجار، قد لا أعرف عنها إلا مجرد رؤوس أقلام، من خلال من حوله، لأنه- على سبيل المثال- قلما تطرق إلى- حزبيته- إلا في إطار طلب تقويم موقف إشكالي، متقبلاً الرأي الآخر، بيد أنه شرح لي بعض معاناته: الظروف الاقتصادية القاهرة- البطالة- واشتغاله كعامل عادي- الأب المريض- الأم- الأطفال الثلاثة-الزوجة ومتطلبات تأمين سبل العيش، بعرق جبينه، في وسط هذا الأرخبيل، بالإضافة إلى أنه كان جد فاعل اجتماعياً، وسياسياً، يواصل الكتابة، والعمل الصحفي في أكثر من منبر يديره أو ينتمي إلى أسرة تحريره.

التتمة على الصفحة رقم ٩

واقع الحديقة العامة في قامشلو

رانيا أمين

تشكل الحدائق الشريان الرئيسي للمدن حيث تمدها بالأوكسجين وتنقي هواءها من الغازات الضارة و السامة كثاني أوكسيد الكربون ،بالإضافة لمنظرها الجميل وأشجارها الباسقة التي تمنح المدينة منظراً خلاباً تجذب السياح الذين يساهمون بشكل أساسي في رفع اقتصاد البلاد ، فالحدائق رئة المدينة ويجب أن تكون هذه الرئة خالية من الشوائب حتى تستطيع أن تكون واجهة حضارية للمدن و تستقطب الناس اليها ، في هذا الصدد قامت مجلة ولات بجولة في الحديقة العامة وسط مدينة قامشلو ،واستطلعت آراء الزوار المتواجدين في الحديقة

حيث أكد الشاب كاوا يوسف من طلاب كلية الحقوق لمجلة ولات أنّ الحديقة هي مصدر الراحة في أيام العطل وبخاصةً في فصل الربيع ،حيث نأتي مع عائلاتنا وأصدقائنا إليها بغية الترفيه عن أنفسنا و الابتعاد عن هموم الحياة و روتينها ،كما أنها المكان الذي يلجأ إليه العامة لممارسة رياضاتهم الصباحية ،إلا أن هذه الحديقة تعاني من بعض المشاكل منها تلك التي تحدث في أغلب الأوقات بين فئة الشباب «الشباب والفتيات « و بخاصة المراهقين منهم حيث تتعرض الفتيات للمضايقات من قبل بعض الفتية الذين يتواجدون في الحديقة من اجل التحرش بهن بكلمات غير لائقة, إضافة إلى عدم الاهتمام بنظافة الحديقة من قبل زوار الحديقة بمختلف فئاتهم و أعمارهم الذين غالبا ما يقومون برمي نفاياتهم على أرض الحديقة و عشبها دون الاكتراث بوجود حاويات مخصصة لذلك .

السيدة فكرت جمال و هي من الأخوة النازحين إلى المدينة قالت لمجلتنا : « الحديقة بالمجمل جميلة ولكن لا يخلو الأمر من وجود بعض المشاكل ، مشيرةً أنهم نازحون وليس لديهم أقارب في المدينة لذلك فهم

في الغياب الصاعق للشاعر والكاتب والمترجم
دلـــجار ســـــــيدا

إبراهيم اليوسف

ينتمي دلجار سيدا- محمد زكي سيد أمين١٩٧٢- ٢٠١٨- إلى ذلك الجيل من شبابنا الجديد الذي جمع بين قيم الأصالة والحداثة، في فكره، ورؤاه، في هذا الزمن الذي انقلبت فيه المعايير والموازين، وباتت الهشاشة، تنخر، بل تغزو المنظومة القيمية العامة، على نطاق واسع، حيث نجد سقوط وتهافت أوساط واسعة وراء ما هو استهلاكي عابر، ما جعل أمثال دلجار يمثلون أنموذجاً مائزاً بيننا، واقعاً وافتراضاً، ولعل هذا الأنموذج الأكثر حماساً للقضايا العامة، في الوقت الذي يهرول فيه مجايلوه وأنداده وسواهم، نحو ما هو فردي، كما تقتضي ذلك طبيعة مرحلة الكوكبة التي نعيش تفاصيلها، بل نذوب في هذه التفاصيل، إذ إن توسع دائرة التفاعل، بعد كسر الحدود، والحواجز، بات يقود كثيرين إلى الغرق في الذات، بدلاً عن الارتفاع على سلم الشأن العام، اجتماعياً، أو وطنياً، أو إنسانياً.

لن تفي هذه المقدمة ما هو مرهون بها، في ما لو لم أقارب بعض جوانب شخصية دلجار، وكما عرفتها، معتمداً على منجزه الثقافي والأخلاقي والنضالي- من جهة- وعلى محيطه الاجتماعي الذي أعرفه، من جهة أخرى، وكانا بعض دواعي معرفتي به، عن بعد، وعن قرب، لأرى فيه إنساناً مائزاً، يمتلك كل تلك المقومات التي تجعله يستحق التقدير، والاحتفاء، والاهتمام، لاسيما إذا وضعنا أمام أعيننا المشهد العام الذي آلينا إليه، وجعلنا نتفاجأ يومياً، بل نفجع، بوجوه كثيرة علاقتها بالقيم الحياتية والنضالية، وحتى الثقافية، ليست إلا سياحية، عابرة، بالرغم من هالات الزيف التي يحيط بها بعضهم ذواتهم، بما يجعلنا نندم على الوقت الذي أولياناه، أو نوليه لنماذج من هؤلاء، وهم إذا كانوا يمثلون الوجه السيء في مجتمعنا- ولابد من أن نعترف أن بين ظهرانينا سيئين أيضاً ولسنا مجتمع ملائكة- إلا أن بيننا أمثال دلجار، ومن يشبهونه في الكثير من الخصال، وهوما يجعلنا نتفاءل بأن ما يبدو من فقاعات في حياتنا إنما هو نتيجة قراءاتنا لمرئيات وسلوكيات دورة الزمن، في إحدى محطاتها العابرة.

وإذا كنت قد لجأت إلى هذه المقدمة وأنا أكتب عن أنموذج الإنسان النقي الذي لم يتأثر بهذا التلوث العام الذي يكتسحنا، لاسيما في فترة ما بعد الحرب، فلكي أبين أن هناك من يظل وفياً للقيم الأصيلة، لاسيما عندما يكون ابن بيئة تحضُّ على الأخلاق الرفيعة، من دون أن يتأثر بكل هذا الطفح والفقاعات العابرة التي تقدم لنا نفسها، بألوانها الطيفية المختلفة، كنتاج ثقافة تكاد تهيمن على مشهدنا العام، انطلاقاً من طبيعتها التي تكتنز دواعي العيش في هكذا بيئة مستنقعية، وهوما علينا الإقرار به، وكيف لا؟، إذ لطالما نتفاجأ بقوافل اللصوص،

يلجئون إلى الحديقة العامة ليقضوا أوقاتهم بحثا عن مساحة من الترفيه ينسيهم همومهم ، وبذلك لا يجدون أفضل من الحديقة صديقاً ومصدراً للسعادة وإزالة الهموم وإراحة النفوس .

وأضافت فكرت « إلا أنّ الحديقة تفتقر للخدمات الأساسية وبشكل خاص الخدمات التي تخص الأطفال والنساء بالمجمل ،كما أن المقاعد المخصصة للجلوس قليلة و معظمها مكسور.

وأشارت أيضا إلى وجود مشكلة في الإنارة ،حيث أنّ ضعف الإنارة تجعلنا نضطر إلى مغادرة الحديقة و العودة إلى المنزل قبل أن يحل الظلام .

وطالبت الشابة «نسرين محمد» و هي من المواظبين على زيارة الحديقة بشكل دائم بالاعتناء أكثر بنظافة الحديقة وخاصة دورات المياه و الصرف الصحي و حنفيات مياه الشرب.

واختتم أحد الشباب والمدعو أحمد جاسم البالغ من العمر ٢٨ عاما حديثه بالقول « الحديقة جميلة جداً إلا أنها تحتاج للتطوير والتحسين كتوفير المزيد من ألعاب الأطفال و إصلاح الموجود منها حيث يشكل الأطفال الفئة الأكثر إقبالا على الحديقة لان الطفل بحاجة إلى اللعب لتنمية قدراته الجسدية و العقلية و تعتبر الحديقة المكان الأمثل لممارسة هذا النشاط بالنسبة للأطفال .

DERENGIYA BARANÊ Û BANDORA WÊ LI ÇANDINÎ Û XWEDÎKIRINA SEWALAN

Efsan Kurdî

Herêmên kurdî li sûriyê cihê çandiniyê ne, xaka wan bi xêr û bêr e, debara xelkê Rojavayê Kurdistanê girêdayî berhemên çandiniyê ye, piraniya çandiniya deverê- bi taybet genim û ceh- bejî ye, ji ber vê yekê, eger baran di dema xwe de bibare dê rewşa abûrî baş be,lê eger baran kêm be, yan jî dereng bimîne wê gavê rewşa welatiyên deverê û abûriya wê dê xerab e.” Wek ku tê zanîn, li piraniya zeviyên berfereh, li Rojavayê Kurdistanê genim, ceh û nîsk tê çandin, di salên dawî de hin berhemên dîtir jî tên çandin, mîna kemûn û gijnîjê .

Îsal rêjeya barîna baranê li Rojava pir kêm bû, ji lewre xelik ketin nava metirsiyê de. Meha azarê bi zuhayî derbasbû bê ku baran bibare. Cotkar dibêjin ku îsal rewşa çandiniyê gelek xerab e, baran nebariya, rewa jî di erdê de tune ye, gelek ziyan gihişte çandiniyê û gelek berhemên wê jî têkçone. Ekrem qasim çotkarek ji amûdê ye, ji kovara Welat re axivî û got: Destpêka çile, rêjeya baranê kêm bû, erdê av venexwar, bi drengî baran bariya, li meha adarê bi temamî nebariya, zad ket û sî negirt, herwiha hatina germê bi ser de hişt ku gelek zad bişewite. Lê piştî van çend tavên baranê yên vê dawiyê ku di meha nîsanê de hatin, dibe ku hin çandinî ji vî mûsimî bê vijiyandin û geş bibe, yek jê berhema kemûnê ye, lê barîna baranê di dema aniha de wê bêtir sûdê bighîne zadê avî, hem jî mesrefa mazot û zeytê kêmdike. Em tev dizanin ku nirxê mazot û alavên dîtir ên avdaniyê gelek bilind û buha ye. dibe ku sala mûsim xerab e, ev rewş dê bandoreke nerênî li xwedîkirina sewalan jî bike. Dema ku şînkahî peyda nebe xwediyê pez neçar dibin ku berê xwe bidin kirîna êm, êm jî buha ye û ne herdem peyda dibe.

Ferîd Xalid xwediyê çend serî pez e, dibêje: Îsal saleke zihayê bû, çêra pez peyda nabe, gelek ziyan li me bûye, ji ber vê yekê em neçarin êm bikirin, lê ew jî pir buha bûye bi taybet li bazara genim. Mûsim pişta cotkar û xwedîkerên sewalan şkandiye, ji ber wê ew destê xwe ji Xwedê re vedikin û bi hêvî ne ku ev sal bi temamî zuha neçe û mûsim têkneçe . ■



واقع الثروة الحيوانية في منطقة الجزيرة، وتأثير قلة الأمطار على الماشية والأبقار، وأسعار اللحوم في المنطقة

يعتمد اقتصاد منطقة الجزيرة و سكانها بالدرجة الأولى على الزراعة و تربية المواشي حيث يشكلان معا عصب الاقتصاد في المنطقة , و يتوقف نمو الثروة الزراعية و الحيوانية على الهطولات المطرية فتنتعش بزيادتها و تنتكس بقلتها و ندرتها.

هذا العام كانت نسبة هطول الأمطار ضئيلة بشكل عام كما أن الأمطار تأخرت كثيرا مما انعكس سلبا على الثروتين الحيوتين في المنطقة.

في هذا التقرير الذي أجراه راديو ولات نلقي الضوء على تأثير قلة الأمطار على الثروة الحيوانية في منطقة الجزيرة

حيث قال المراقب البيطري مروان محمد لراديو ولات أنَ قطعان الماشية والأبقار في منطقة الجزيرة في تناقص كبير من حيث أعدادها نتيجة ظروف الجفاف هذا العام مقارنة مع السنوات السابقة وأوضح أن العدد قد تناقص إلى ٦٠٪.

وبخصوص أسعار اللحوم وتأثرها بهذا التناقص، قال محمد : أنَ الأسعار منخفضة وستنخفض بشكل أكبر في الأيام المقبلة مع استمرار فقدان الأعلاف، لكن على المدى البعيد ونتيجة تناقص أعداد المواشي سنلاحظ ارتفاع لأسعار اللحوم بشكل كبير بعد سنة.

وعن الرعاية الصحيَة للثروة الحيوانية، أكَد المراقب البيطري أنَها تتم من قبل المربّين أنفسهم، إضافةً إلى جهات رسميّة تهتم بهذا الجانب وتؤمن اللقاحات اللازمة لهم تجنباً لحصول أي نفوق بين القطعان.

و أضاف الأستاذ مروان بأنَ حركة التصدير عبر المعبر الحدودي مع إقليم كردستان تفيد كثيراً في

تتمة المقال:
((في الغياب الصاعق للشاعر والكاتب والمترجم دلجار سيدا))

لم أرد أن أفصل في الحديث عن هذه المعاناة، لدواع كثيرة، إلا أنني عرجت عليها، لأبين أن هناك من يقرأ، ويكتب، ويمارس نشاطه العام: معلماً للغة، وكاتباً، وشاعراً، وصحفياً، وحزبياً، وعاملاً عادياً يعاني من وطأة البطالة، إلا أنه لم يتوقف عن الإنتاج وهولا يتمكن من إيجاد مكان أو طقس للكتابة والقراءة، إلا أنه لم ينحن، أمام كل هذه الظروف القاهرة وفي هذا ما يؤكد سمو روحه، وشموخه، ونبله.

معنيون جميعاً بشأن والديه :أطفاله وأسرته، مخطوطاته، تفاصيل مدونة سيرته، ومواقفه، وهوما ألقيه-أكثر- على عاتق محيطه- ولي ثقة بهذا المحيط- لأنه أعطانا جميعاً، بلا حدود، بلا مقابل، وبلا طلب منه، وبأعظم ما يمكن أن يعطيه امرؤ في سنه، كرس حياته لخدمة رسالته. إن تخليد ذكرى دلجار، كمثقف عصامي، مناضل، ورجل وطني، مبدئي، شهم، نبيل، لابد من أن تكون على رأس قائمة اهتماماتنا، منذ الآن، ومن هنا فإنني لأدعو إلى تخصيص-ملفات- عن عطائه الثقافي، بل وتوثيق هذه الجوانب من قبل المعنيين من حوله، وتخصيص جائزة باسمه تعطى في مجالات العناية باللغة أو الترجمة، وغيرهما...

واثق أن نتاج الشاعر، والكاتب، والمترجم، دلجار كانت ستملأ المكتبة، لو توافرت له الظروف المناسبة، فهو لم يهاجر لأسباب عدة: ارتباطه بمكانه، وبأبويه، وفي هذا ما جعلنا نخسر الكثير الذي كان منتظراً منه أن يقدمه لنا، بالرغم من أن ما قدمه- وهو عناوين- ليدل على شخصية هذا المناضل القدير، والنبيل، والأصيل.

*ثمة دعابات كثيرة في رسائل دلجار إلي، ومنها حديثه عن- القطب العائلي الثالث في العالم- ولهذا الحديث حكايته، أتمنى أن أتمكن يوماً ما، من الكتابة في ذلك، وغيره، وغيرهما، لتبيان مدى جمال روحه، وفرادته، وعلو قامته

** محمد زكي أبو أفين حزين عليك..حزين «لقد شل نبأ رحيلك قواي» كما حدث مع غياب الشيخ عبدالقادر..... ■

التخفيف من خسارة المربي في حال انخفاض أسعار المواشي وارتفاع أسعار الأعلاف، لكنّه أكّد أنَ المستفيد الأكبر من التصدير هو التاجر.

وقال أيضا: " في ظل النقص الحاصل في الأعلاف يحاول المربي أن يتخلص من أكبر عدد من القطيع، وهذا بدوره أيضاً يساهم في انخفاض أسعار القطيع واللحوم".

أمَا بخصوص استيراد الأعلاف فقد أكَد مروان أنَ أسعار الأعلاف المستوردة لا تتوافق مع إمكانيات المربي الماديَة وأضاف بأنَ أسعار الأعلاف ذات المصدر المحلّي أيضاً سوف ترتفع في ظل هذا الجفاف ، ونوّه بأنَ لتحكّم التَجار واحتكارهم دور أيضاً في تحديد أسعار الأعلاف ضمن المنطقة وخارجها.

وأكَد في سياق حديثه على ضرورة وجود محطة أبقار أو محطّتي مواشي في المنطقة لتحقيق الاكتفاء الذاتي من اللحوم والألبان ومشتقات الألبان، إضافة لمساعدة المربين في تأمين الأعلاف لمواشيهم.

وأضاف أنَ وجود معامل للألبان والأجبان في المنطقة من شأنه تطوير واقع الثروة الحيوانية فيها وجعلها تساهم بشكل كبير في تحسين دخل المربين في هذا المجال، مركّزاً على ضرورة وجود الرقابة الصحية على مثل هذه المعامل. ■

*ev hevpeyvîn berî koçbarkirina Diljar hate kirin

Hevpeyvîn ligel WELAT AGİRÎ

Hevpeyvîn: Mihemed Zekî Mihemed

1. Bi navê kovara Welat bixêrhatina te dikin, tu dikarî xwe bi xwînerên kovarê bidî nasîn?

Gelekî spas dikim û ji kedkarên kovara Welat re serkeftin û miyeseriyê dixwazim. Ez ji bajarê Agiriyê me. Min li zanîngeha Uludagê beşa zanîstê xwend û ji sala 2009an vir ve mamostetiyê dikim.

2. Helbestvan Ehmedê Xanî rûbareke mezin di nivîsên te de girtiye, gelo sedemên vê guhdana Xanî li cem te çine?

Nivîsên min ên derheq Mem û Zîna Ehmedê Xanî de, ji lêkolînan zêdetir hin pirs û raman in, ku min xwest bi xwînerên xwe re parve bikim. Ehmedê Xanî feylesofekî mezin e û em bi hebûna kurdekî wek wî serfiraz û serbilind in. Lêbelê mirov nikare vê berhemê beyî çend pirsan bixwîne û derbas be. Mabesta nivîsên min jî lêgerîna bersîvên van pirsan bû, wek mînak;

- Di Mem û Zîn de peyva kurmanc deh cara, peyva kurd jî çar cara derbas dibe, ka gelo sedemên vê çine? Çi ferq di navbera kurmanc û kurd de heye?

- Piraniya peyvên di Mem û Zînê de hatine bikaranîn farisî û erebî ne. Eger di kitêbekê de peyvên biyanî ji yên kurdî zêdetir bin, gelo meriv dikare bêje ew pirtûk bi kurdî ye?

- Xanî di sedemên bi kurmancî nivîsandina xwe de dibêje, “Min meydana kemalê dît bêkemalî” yanî di warê nivîsê de meydan xalî bû. Divê mirov bipirse ka ya girîng xalîbûna meydanê ye yan qebîliyetê nivîsê ye?

- Dîsa dibêje min ji bo gelê xwe gelek cefa kişand, zimanê kurdî rêk û pêktir kir. Lê di navbera zimanê kurdî yê gel pê diaxive û zimanê Mem û Zînê de ferqeke mezin heye. Mabesta wî ya bi rêk û pêkkirinê çiye?

3. Cizîrî li cem gelek nivîskaran cihekî berz û bilind girtiye, Welat Agirî tu bi çi çavî li Cizîrî dinêrî?

Ji bo min Mele Ehmedê Cizîrî edebiyatnas, dîroknas, civaknas û fîlozofê sedsala xwe ye.

4.Te di gelek mijaran de nivîsiye, lê guhdaneke mezin daye kurdên Beloçîstanê, sedem û armanc jê çine?

Erê li Beloçîstanê kurd hene û jimara wan jî pêncî-şêst hezar e. Ev sedan sal in ji welat û miletê xwe dûr in û di nav beloçan de jiyana xwe didomînin. Paşnavên pemûyan “kurd” e. Lê hezar heyf êdî ji kurda zêdetir dişibin beloç û pakistaniyan. Di navbera çand, erf û edetên wan û yên beloçan de ferqeke wisa mezin nemaye. Min di sala 2016an de fersend dît û berê xwe da cîh û warên kurdên Beloçîstanê. Dîtin û nasîna wan kurdên xeribîstanê kêfxweşî û dilşadiyeke bêhempa da min. Û pey re min ev serdana xwe bi deh gotaran gihand xwînerên malpera Rîataza. Armanca wan nivîsên min jî parvekirina dilşadiyê û ragihandina malûmatên derbarî kurdên Beloçîstanê bû.

5. Tu bi wergerê jî mijûl bûyî, gelo werger çi rolê di jiyana miletan de dilîze?

Min çend miqaleyên edebî ji îngilizî wergerandin kurdî, ku ew miqale li ser nivîskarên navdar ên başûr bûn. Lê mixabin kar û barê dibistanê derfetê nade min, ku ez xebata wergerê bidomînim. Werger gelek wext dixwaze û divê mirov herdu zimana jî baş bizanibe. Rola wergerê ew e, ku ji miletekî re derî û pencerên nû vedike. Bi vebûna van derî û pencereyan re, sînorên hewşa edebiyatê fireh dibe, ku peyv û ramanên miletekî qalikên xwe dişkînin û ji wan qalibên teng azad dibin.

6. Di wê dema ku dezgehên ragihandinê tune bûn, çi bandora radiyoya Rewanê li ser civaka kurdî hebû?

Bandora Radyoya Rewanê ewqas mezin e, ku li Enqerê klam, li Şamê çîrok, li Bexdayê destan û li Tehranê jî piyesên Kurd û Kurdmancî dida guhdarkirin. Di dem û dewraneke wisa dijwar de, ku digotin miletekî bi navê kurd tune ye, dengê Rewanê li ser xaka kurda olan dida. Ez dikarim bêjim radyoyê, ji xêncî kurdên welêt, tesîreke mezin jî li ser kurdên Ûrisetê hişt, ku ew kurdên ji welêt dûr, ji bişaftin û asîmilebûnê xilas bûn. Û divê miletê kurd tu car serokê radyoyê, Xelîlê Çaçan, ji bîr neke, ku di nava 24 salan de ji ked û emeg zêdetir emrek da çand û zimanê kurda.

7. Di baweriyên te de hêmanên sazkirina zimanekî standard çine?

Bi kurt û kurmancî, zimanê standerd ew ziman e ku ji aliyê hemû ferdên miletekî ve tê femkirin û axaftin. Heke em zimanê kurda binhêrin, mirov nikare bêje zimanekî hevpar (standerd) heye. Di van şert û mercên îro de,

- Eger kurd derbasî elfebeyeke hevpar bibin,

- Jimara televîzyon û radyoyên netewî zêde bikin

- Rojname, pirtûk û kovarên bi zimanê kurdî biweşînin

- Li ser malperên întnernetê xizmeta çand û zimanê xwe bikin

- Medyaya sosyal bi zimanê kurdî bikar bînin

- Çûyin-hatin, dan û stendin yanî têkiliyên xwe ên di navbera herêma de pêş bixin, dê bibin xwedî zimanekî hevpar û standerd.

8. Tu rewşa zimên û çanda kurdî li Rojavayê Kurdistanê çawa dinirxînî?

Ziman di bin sîwana çandê de tê parastin û li gorî çandê şikl û qalib digire. Min heya niha, mixabin, fersend nedîtiye, ku serîkî bidim Rojavayê Kurdistanê û bibim şahidê çand, kultûr û stîla jiyana wan. Lê wek me behs kir çand û ziman bi hev re girêdayî ne. Eger em miqayesekê di navbera zimanê rojava û yê bakur de bikin, ez dikarim bêjim kurdiya rojavayiya xurttir e. Ev xurtbûna ziman jî nîşan dike, ku çanda xwe parastine û li erf û edetê xwe xwedî derketine. Di van salên dawî jî, kurdînûsên rojavayî hêdî hêdî derbasî elfebeya Celadet Elî Bedirxan dibin ku ew jî ji bo zimanekî hevpar gelekî girîng e. Û dîsa em dikarên bêjin weşanên radyo, pirtûk û kovarên kurdî di pêşketina çand û zimên de roleke mezin dileyîzin.

9. Gotina dawî

Saxî û silametiya we dixwazim û ji Kovara Welat re jî emrekî dirêj û serkeftin... ■